

Deftera Siyasî ya PDKÎ derheq erdhejê û bûyerên piştî wê daxuyaniyek weşand

»»»» R:5



Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Gistî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (314) 21-11-2017 Buha (1000) Tûmen



Mistefa Hicrî:

Şikesta Kerkûkê dawiya rê nine!.

»»»» Dom R:4

Erdheja siyasî

»»»» Dom R:2



Kurdistaniyan birînên erdhejlêdayiyan cebirandin



Êvariya roja Yekşemiyê 21ê Xezelwera 1396an, erdhejekê demjimêr 10ê şevê li navçeya Ezgelleya ser bi Serpêla Zehaw a parêzgeha Kirmaşanê da,ku mezinahî û bihêziya wê erdhejê bi qasekî bû ku li çendîn welatêm derdorê jî hest pê hate kirin.

»»»» Dom R:8

Sergotar

Erdheja siyasî

N: Kerîm Perwîzî

Wê şeva ku erdhejek bihêz li jêr zewî de li Kurdistanê da, û çendîn bajarên Kurdistanê li Parêzgeha Kirmaşanê tûşî karesatê kirin, rejîma Komara Îslamî wisa dizanî ku ji vê bellayê dûr e, lê gellek nekişand ku erhejek siyasî hemû cismê rejîmê lerizand.



Bi salan e ku rejîma Îslamî ya Tehranê bi hêcet û kompiloyên curbicur dixwaze Kurdistanê kavil û gelê kurd jî tera bera bike. Hewcehî wê jî nake ku em dubare data û statîstîkên bêkarî û rewşa aloz ya aborî û hejarî û asta paremayîbûn û xirabiya jiyanê li parêzgehên Kurdistanê de bixwînin, belkî rojane li waqi`i û realîteya jiyana xelkê Kurdistanê de, em hiştina Kurdistanê bi hemû parêzgehên xwe ve li hejarî û paremayîbûnê de dibînin.

Di heman demê de rejîma Komara Îslamî li jêr navên curbicur de hewil dide ku Kurd û Kurdistanê ji hev belav, û bike maleke wêran û neteweyek parçe-parçe, daku bo heta-heta kedî be. Rejîma Komara Îslamî û dem û dezgehên îtila`atî û bi nav çandî û ewlehiyê hewil dane, û didin ku pirrengîtiya zarawa û binzarawa û rengîniya deverên curbicur ên Kurd û Kurdistanê bikine hêvênê parçe-parçekirina Kurdan.

Herweha pirrçandîtî û pirrayîn û mesebiya li nav neteweya kurd de jî bikine hêvinê dubendî û netifaqiya li nav wî gelî de, û bi peyrewkirina vê siyaseta dujminkarane, bi ser kurdan de zal bin.

Siyasetek din ya wan jî eva bûye ku çiqas dem û dezgehên serkutkar hebûne, lê bi xapandin, fend û fêl û çewaşekariyan ve hewl dane ku di

PDKÎ û KCK li hev civiyan



Di civîna di navbera PDKÎ û KCK`ê de, çendîn xalên girîng hatin gotûbêj kirin.

Roja Çarşemiyê 24`ê Xezelwera 1396`an, şandeke KCK`ê bi serperestiya Riza Altûn endamê Konseya Birêveberiya KCK`ê û çend endamên din ên rêberiyê, serdana Deftera Nûneratiya PDKÎ li bajarê Silêmaniyê kirin, û ji aliyê şandeke rêberatiya PDKÎ ve bi serperestiya Mihemed Nezîf Qadirî endamê Deftera Siyasî ya PDKÎ, pêşwazî ji wan hate kirin.

Di vê civînê de herdu aliyan dîtingeh û boçûnên xwe ên siyasî li ser pirsên siyasî ên rojevê û metirsiyên li ser tevgera Kurd li her yek ji beşên Kurdistanê xistin rû. Di vê civînê de bas ji yekdengiya wan welatan hate kirin ku Kurdistan bi ser de hatiye parvekirin, û herwisa bas ji pozbilindiya ne di ciyê xwe de ya wan, piştî guhertinên ku li pey referandomê û êrîşa li ser Kurdistanê çêbûn, hatin kirin, ku dibe xwendineke rast li ser bê kirin, û her yek ji hêzên berpirs ên Kurdistanê, û hêzên siyasî ên Başûr bêne handan, bo yekdengî û yek helwestiyê, û dûr bikevin ji boxtanpêkirin û tawanbarkirina yektir, û rê nedin ku bandora nerênî li ser tevgera Kurd di beşên din de bike.

Di beşeke din ya vê civînê de, rola her yek ji hevpeymanan û rikeberiya dijwar û bizehmet ya siyasî û îdeolojî di navçê de, û rola tevdanîkarane ya Komara Îslamî kete ber bas, û pêwîstiya li hev nêzîkbûna hindî zêdetir ya hêzên siyasî ên Rojhilat bi hewce hate zanîn.

Piştî baskirina li ser çendîn xalên cihê baldanê, bo herdu hêzên du beşên serekî ên Bakûra Kurdistanê û Rojhilata Kurdistanê, wate KCK`ê û PDKÎ, pêdagirî li ser civînên zêdetir û hevahengiya pêwîst li hemû biyavan û bi taybetî bo pûçkirina pîlanên neyarên Kurdistanê hate kirin.



nav bîr û raya xelkê Îran û cîhanê de wusa nîşan bidin, ku wê rejîmê pêgehek civakî û xelkî heye û serbarê hemû pirsgirêk û astengiyan, xelkê Îranê hêj rejîmê ji her alternatîveke din bêtir û guncawtir dizanin!!

Gava erdhejê li Kirmaşanê da, rejîm li benda wê bû ku erdhej pitir kurdan wêran, belengaz û çav li dest bike, lewma bi hawara xelkê lêqewmayî ve neçû, û wusa dihesiband ku pîlana wê ser girtiye, û bajarên din dê bibêjin: îca bi me çi? Bila Kelhor û Yarsan û Şî`e tê de biçin!

Lê zêde nekêşa ku erdhejek bihêz a siyasî li Komara Îslamî xist, ku ew jî erdheja xelkê bû. Gelê Kurd bi hemû şiyan û karîna netewî ve daketin qada piratîkê de, û alîkarî ji bo hevneteweya xwe li gund û bajarên erdhejlêdayî kom kirin û nîştimana birîndar kevandin.

Di vê çarçoveyê de çi li nav neteweya Kurd, û çi di cihên din ên Îranê de, xelkê alîkariyên xwe nedane demûdezgehên rejîmê û bi eşkere ji wan re digotin ku baweriya me bi we tuneye, û hûn alîkariyên me didizin û bo meremên din bikar tînin.

Erdheja sirûştî li Kurdistanê xist, û qurbanî û kavilkarî li pey xwe re anî, lê kevandina van birînên Kurdistanê pirr dijwar nine, û Kurdistan dê bihêztir ji caran rabe ser xwe.

Lê erdheja siyasî ku li Komara Îslamî xist, him pîlan û kompiloya qirêj a çendîn salî pûç kir, û neteweya Kurd jî wek yek neteweyê daket qadê, û him jî hemû çewaşekariyên rejîmê bûne bilqa ser avê û xelkê nîşan dan, ku rejîma Îranê ne tenê tu pêgeh û nifûzek di nav civakê de nine, heya baweriyê pê nakin, ku cotek pêlavan jî bidine dest demûdezgehên wê, û bixwe riya gehandina alîkariyan dane pêşberî xwe, daku hewcehî bi rejîmê nebin.

Ev erdheja siyasî dê şeqarên nava rejîmê de kûr û firehtir bike. Çarenivîsa rejîmê jî dişibe Xaniyên Mêhr, û tab û bergeya erdhejek din nagrin.

Desteyeke din ji ciwanên Kurd ên nîştimanperwer tevlî rêzên şoreşê bûn

Devreya 227`an a destpîkî a pêşmerge dawî pê hat, û cejna tevlîbûna desteyek ji ciwanên Kurd yên Rojhilat, ku tevlî rêzên şoreşê di çiyayên Kurdistanê de bûn, bi rê ve çû.



Li gora rapora gihîştî malpera Kurdistanmedia, roja Pêncşemî rêkevta 25`ê Xezelwera 1396`an, desteyek ji keç û xortên lêhatî ên Kurd piştî derbazkirina devra destpêkî a pêşmerge, bi awayê fermî bûne pêşmerge û çeka berevanîkirin ji kerameta neteweya Kurd avêtin milê xwe.

Rêûresm bi xwandina sirûda neteweyî a "Ey Reqîb" û ragirtina deqeyekê bêdengiyê ji bo rêzgirtina ji canê paqij yê şehîdan dest pê kir.

Ev rêûresma ku bi adamdebûna çend ji endamên rêberatiya hizbê û beşek ji pêşmergên Hêza Taybet û malbatên şehîdên Rasanê di çiyayên Kurdistanê de hate lidarxisitin, tê de rêzdar "Kerîm Perwîzî" endamê Deftera Siyasî a PDKÎ ji beşdaran re axavî.

Navbirî di destpêka axavtina xwe de, tevî pîrozbahîkirin ji ciwanên nû ên ku tevlî rêzên pêşmergên Kurdistanê bûne, bas ji erk û bandora hêza pêşmergên Kurdistanê, di dirêjahiya dîroka gel û wezîfeya girîng û hesas a dîrokî ya wan kir û got: Sedema hilgiritna çekê ji aliyê pêşmerge ve, şerfirotin û alozîdirustkirin nine, belku hewldan e ji bo dûrxistina gel û nîştiman ji alozî û şerê ku hatiye sepandine.

Ciwanên ku di devrê de pişkdar bûn jî gotin ku: Dem dema piraktîkê ye, dema bicihanîn wan dersan e, ku di perwerdehiya hizbê de fêr bûne, û dibe di wan di piraktîkê de encam bidin.
Herwiha di beşek din a axavtinên xwe de got ku hûn weke pêşmergeyên xwedî bîr û îrade, ku di vê xwandingehê de perwede bûne, dibe ku bibne pêşmergên bi îrade û berxwedêr, da ku xizmeta gel û nîştiman bikin, û dema ku dikevin nava hundirê civakê, hemû aliyên civakê digel şoreş û berxwedanê bidne naskirin.

Piştî axavtina "Kerîm Perwîzî", çend sirûdên şoreşgerî, helbest û herwiha peymanên devra destpêkî a pêşmerge pêşkêşî beşdaran hate kirin.
Di dawiya vê merasimê de jî, ji aliyê hevjîna şehîd "Kemal Xizrî" û şehîd "Luqman Şêxanî" ku di hemaseya jibîrnekirî a "Qereseqel"ê de canê xwe fîdayî azadî û nîştiman kirin, xelat bi ser pêşmergên serkevtî yên devra 227`an de hatine parvekirin.

Hewleke nû ya rejîmê bo xapandina bîrûraya giştî

Komara Îslamiya Îranê di hewleke nû ya din de, di nava hewldanan de ye ku bîrûraya giştî bixapîne, û bûyerên dîrokî ên Kurdistanê bi awayekî din nîşan bide.

Di çarçoveya şerê nerm ê Komara Îslamiya Îranê de, û bi serperestiya Wezareta Îtila`atê û navnedên ewlehî û ajantiyê ên rejîmê, dezgeha Deng û Reng di çend rojên borî de çendîn bernameyên bi nav dekomentarî belav kirine, ku tê de hewl bo lekedarkirina rûçikê tevgera rizgarîxwazane ya gelê Kurd û tevlîhevkirina dîroka hevçerx ya Kurdistanê hatiye dan.

Kanala "Mustened" ya ser bi Îdareya Deng û Reng ya rejîmê bi belavkirina zincîre bernameyên televîzyonî li jêr navê "Pîşmergan" tevî awrîdana li bûyerên pêş û paş şoreşa gelên Îranê ji riya komeke kesên nefsnizm ên xweşxizmet bi rejîmê ku kesayetiya wan ya kirêt ji xelkê re eşkere û naskirî ye, hewla çewtekirina rastiyên dîrokî û xwe bêparkirina ji tawan û cinayetan derheq gelê Kurd dane.

Di vê zincîre bernameya pirr ji derev de, ku ew qasê kerb û kina amadekarên bernameyê li dijî gelê Kurd pê ve xûya dike, ji riya kesên wekî Fayiq Ferecî, Rehîm Ehmedî, Xelîl Rezayî, Wahid Es`edî û çendîn çekhilgirên din ên rejîmê ve hewla têkdana kesayetiyên diyar û xûya ên nava tevgera rizgarîxwaziya Kurdistanê û pêvajoya xebata mafxwazane ya gelê me hatiye dan.

Herwisa di nava bernameyeke din ya bi vî rengî de, li jêr navê (Ber Bolendayê Sexrêha) ku bas ji jiyana pasdarê bednav ê rejîmê Semed Bostanî dike, hewl hatiye dan ku ji riya kesên bednav ên wekî "Beytullah Dadxah" qehremansaziyeke derevîn ji navbirî û hevdestên wî raxin ber çavê bîner, û di heman demê de jî, hêzên şoreşger ên Kurdistanê, wekî aliyekî girêdayî bi bîhaniyan û dijî azadiyê, û wekî



eniya têkder binasînin.

Hewcehî baskirinê ye ku ew pasdarê cinayetkar ê rejîmê di temenê xwe yê pirr ji şerm û cinayet de, û di çarçoveya xweşxzimetiyên bi rejîma xwe, çendîn ciwanên Kurd bi sedema azadîxwaziyê şandine nava reşçalên rejîmê de, û cara dawî li 26`ê Cozerdana sala 1395`an de di dema destanrêsiya jibîrnekirî ya Qereseqel a Şinoyê de hate kuştin.

Ya ku eşkere ye, ew e ku rejîma dijîKurd li Tehranê ji hemû hêza xwe mifahê werdigre, bona xapandina bîr û raya giştî ya gelên Îranê, û pêştir jî hewlên weha hatine dan, ku armanca wê di rastî de têkdana dîrokê û cureyek şerê nerm bûye li dijî berdengê xeyrî Kurd, da ku ji vê riyê ve hêcetan bînin ji bo cinateyên xwe ên derbazbûyî, û rewayiyekê bidin kiryarên xwe, herçend bi awayê demkî jî be.

www.arsiv.kurd.org

Şikesta Kerkûkê dawiya rê nine!



Mistefa Hicrî

Şikesta serkirdayetiya siyasî ya Kurdê Başûr li hemberî êrîşa Heşda Şe`ibî û hêza hikûmeta Bexdayê bo navçeyên kêşe li ser ên Başûr bi taybetî Kerkûkê bi vî awayî ku me dît, hewceyî bi şirovekirin û encamwergirtineke bê alî heye, da ku em ji vê bûyerê dersê wergirin, -helbet hekî em wergirin-. Herwisa erk û wezîfeya dîrokzanan e, ku rastiyên vê bûyera karesatbar eşkere bikin, ku heya niha bo gellekk kesan û yek ji wan bo min ne zelal in.

Lewra ya ku ez dixwazim îşareyeke kurt pê bikim, çend xalên siyasî ên girîng in, ku min bi hewce zanî di vê rewşa dijwar de, ku Başûra welatê me bi taybetî û hemû Kurdistan bi giştî pêre berbirû bûye, li ser wan bisekinim:

Yekem-Hinek ji çavdêrên siyasî bi taybetî ên ku bi her sedemekê ve be, digel giştpirsiya bo serxwebûna Kurdistanê nebûn, yan ser vê baweriyê bûn, ku dem gincaw û bi cî nine, gihîştine vê encamê ku ew êrîş encama giştpirsiyê bû, wate hekî giştpirsî nehatiba kirin, ew êrîş nedihate kirin.

Ew boçûna ji vê derê ve çavkanî digre, ku ew kes heya niha jî bi başî şarezayî siyaset û pilanên rejîma Îranê li Îraqê, û bi taybetî li ser Kurd û herêma otonomiya Başûr nînin. Rejîmek ku hebûn û vegeşiyana nifûz û deshilata xwe di vê navçeyê de, di şer û tevdanîkariyan de dibîne,û bona gihîştina bi van armancan jî beşeke zaf ji dahata welatê xwe bona bihêzkirina girûp û dewletên terorîstî, pêkanîna dubendiya tayifî û ayînî û …hwd xerc dike, û dijminê herî serekî ê gelê Kurd e di hemû beşên Kurdistanê de.

Her di rastaya vê siyasetê de, û piştî hiloşîna rejîma Sedam Husên û bi taybetî piştî vekişiyana hêzên Amerîkayê ji Îraqê, di sala 2011`an de, rejîma Komara Îslamiya Îranê, cihê wan ê betal tejî kir, û bilez nifûza xwe di hemû astên deshilatê û siyaseta hikûmeta Bexdayê de cihgir kir. Yek ji van astên girîng, pêkanîna hêza milîşên Heşda Şe`ibî ye, ku beşeke zêde ji çek, bûdce û bi taybetî perwerdehiyê ji aliyê rejîma Komara Îslamiya Îranê ve bo wan tê amadekirin, û niha beşeke zaf ya vê hêza mezin biryarê ji Qasim Silêmanî fermandarê hêza Quds ya Spaha Pasdaran werdigre, û di biyavê ayînî de, pêyrewiyê ji Xamineyî rêberê Îranê dike.

Li ber ronahiya vê siyaseta Komara Îslamiya Îranê, tiştekî veşartî nebû ku hikûmeta Bexdayê hemû van navçeyên kêşe li ser ê Herêma Kurdistanê ku piştî êrîşên DAÎŞ`ê hêzên xwe jê vekişandibû, di derfeteke bi cî de, cardin dest bi ser de bigre, jiber ku hekî em wisa bihesibînin ku hikûmeta Bexdayê mebest û niyeteke wisa jî tunebe, Komara Îslamî ku formgirtina hikûmeta Herêma Kurdistanê bi bê navçeyên kêşe li ser jî qebûl nake, çawa dikare berfirehbûna deshilata hikûmetê di van navçeyan de qebûl bike?

Di rastî de yek ji armancên girîng ên Tehranê di avakirina Heşda Şe`ibî de bikaranîna wan e bona ber bi pêşvebirina siyasetên xwe, û yek ji wan êrîşa li ser Kurdistanê (1).

Berî êrîşên DAÎŞ`ê bû ku Malikî hêza Îraqê bi fermandehiya Ebû El-emîr Zeydî şand da ku Kerkûk û Xaneqînê bigrin. Ji çend salan berî niha ve jî, bûdceya Hikûmeta Herêma Kurdistanê birîne, da ku bi zext û givaşa aborî ji navxwe ve biherife.

Bi vî rengî em digihîjin vê encamê ku hekî rapirsî nehatiba kirin jî, pîlana destbiserdegirtina navçeyên kêşe li ser bi kerkûkê ve jî, ji aliyê Bexayê ve, wê bihata cîbicîkirin, bi vê cudahiyê ku renge ew gelekomeya dijminên Kurdan ya piştî rapirsiyê, û piştgiriya ji Bexdayê bi awayekî din bûya.

Duyem: Ew êrîşa piştî rapirsiya Başûra Kurdistanê rû da, û di encamê de Kurdan beşeke zêde ji deskevtiyên xwe ên siyasî ji dest dan, şikesteke mezin bû, ku bandora neyînî li ser derûna hemû takên Kurd danî, û

Mistefa Hicrî:

Ew şikesta dawiya rê nine, Başûr wê rabe ser piyan, û wê toza vê şikestê li ser bedena xwe ya birîndar dakute, her çawa ku di derbazbûyî de piştî şikestan rabûye ser piyan.

birîneke dîrokî ya din bû li ser laşê bixwîn ê Kurdistanê. Lê eva yekemîn şikest û yekemîn birîn nebû, di derbazbûyî de jî, gellek carên din, û her carê perçeyek ji laşê vê nîştimanê ketiye ber êrîş û pîlanên dijminên me, û jiber ku ew bihêztir bûn, me di hemberî wan de şikest xwariye. Renge di pêşerojê de jî ew sînaryo ducarî bibin.

Lê heya wê demê ku stem û dagîrkariya dijminan hebe, xebat û rikeberiya Kurdan bo rizgariya ji dest zulm û zordariyê jî berdewam dibe.

Ku wisa bû, ew şikesta dawiya rê nine, Başûr wê rabe û wê toza vê şikestê li ser bedena xwe ya birîndar wê dakute, her çawa ku di derbazbûyî de piştî şikestan rabûye ser piyan.

Dîroka sed salên borî ê xebata kurd û şikestên wê di dema Komara Kurdistanê de, şoreşa Simko, Şêx Se`îdê Pîran, Mela Mistefa barzanî û enfal û kîmyabaran û …hwd, hemû vê rastiyê dibêjne me. Heya ji wan hemû bûyeran nûtir, berxwedana pêşmerge li eniyên şerê Pirdê, Zomar, û…hwd şahdiya vê didin ku Başûr neketiye qedeman û henaseya berxwedanê her niha jî bihêz e. Sêyem: Lê digel hemû wan ketin û rabûnan de, gellek mijarên cihê pirsyarê hene, ku êş û azara van ketinan zêdetir dikin, ji aliyekî din ve jî gellek ders û ezmûnên cihê lê hînbûnê di naveroka van têkşikanan de têne xûyakirin, ku hekî ew pirs nehêne bersivdan, û em dersê ji wan wernegrin, em mehkûm in bi vê ku di pêşerojê de bo careke din jî rastî van karestan werin, herwekî ku çawa eşkere bû ku bersiva pirsyarên şikestên berê li cem me nebûne, û me ders jî jê wernegirtine:

Gelo dîsan bi silaveke dijminên xwe, emê dilxweş bin, û ewê li me bibin dost, û emê pişta xwe bi wan qahîm bikin di rojên tengaviyê de? Me jêve ye ku rastî her hemû li cem me ne, û xelkê din her çi dibêjin ne rast in?

Dîsan kerb û kina berê, û yektirşikandin û sivikatîkirina bi yektir, wê hizr û bîra me dagre, yan lêborîn, piştqahîmiya bi yektir û yekîtiya refên gel, wê çawaniya pêwendiyên di navbera me de, wê diyarî bike?

Di Kurdistanê de hewl tê danê, ku berjewendî û stratejiya neteweyî bê darêtin, û hemû aliyên siyasî bi xwe ve bigre, yan her berjewendiya hizba serdest dibe? Di encam de Hikûmeta Herêma Başûr a Kurdistanê di hemberî gendeliya piraniya beşên aborî û leşkerî û îdarî û …hwd de bêdeng dibe, yan nexêr, vê şikestê ew veciniqandine, û wê bi xwe de bên, û wê dest bikin bi avakirina bingeheke bihêz bo Kurdistaneke serbixwe, ku zêdetir ji %90 ji xelkê Başûr deng jê re dane? Pêşeroj wê bersiva van pirsyaran û gellek pirsên din ên bi vî rengî bide me.

(1)-Nivîskarê vê gotarê, di dawiya sala 1393`an de, gotarek li jêr navê “Komara Îslamî çi xewnekê bo Îraqê dibîne? (http://sikirter.org/detail.aspx?id=911&LinkID=6) belav kiriye, wê demê di vê gotarê de pêşbîniya rola Îranê di êrîşên DAÎŞ û Heşda Şe`ibî de bi vî rengî ku heta niha çûye pêş kiribû.

www.dirokvakurd.org

Deftera Siyasî ya PDKÎ derheq erdhejê û bûyerên piştî wê daxuyaniyek weşand



Deftera Diyasî ya PDKÎ derheq bûyera xwezayî ya erdhejê û alîkariya berfireh ya xelkê Kurdistanê ji xelkê zirardîtî re, daxuyaniyek belav kir, û ew alîkarî wekî afirandina hemaseyê (destanrêsiyê) ji karesatê bi nav kir.

Deqa vê daxuyaniyê weha ye:

Neteweya Kurd ji karesatê, destanrêsî afirand

Hevwelatiyên rêzdar!
Xelkê hişyar ê Kurdistanê!
Mixabin roja 21`ê Xezelwera 1396`an, bûyera xwezayî ya erdhejê li Kurdistanê da, û li her du aliyên Rojhilat û Başûra Kurdistanê wêraniyek zêde lê ket, ku ew wêranî û qurbaniya ku lê ket, li bajarên ser bi parêzgeha Kirmaşanê ew qas zaf bû, ku karesateke mezin lê ket.

Li gora hinek ji amarên rejîmê (ku gellek jî cihê baweriyê nînin, û wêranî û qurbanî gellek ji vê hindê meztir û zêdetir in) nêzî 500 kuştî û zêdetir ji 10 hezar birîndar lê ketine, zêdetir ji 12 hezar yekîneyên akincîbûnê bi tewahî herifî ne, û bi hezaran mal û yekîneyên din zirar dîtine, bi awayekî ku kêrî rûniştinê nahên. Çendîn bajar û nêzî 1600 gund jî ber xisara erdhejê ketine, û hemû evane û hatina sirr û serma û baran û qurbaniyên piştre û ...hwd, nîşan didin, û dibêjne me ku hejmara qurbanî û wêraniya vê karesatê gellek zêdetir ji vê bûye, ku hatiye ragehandin, û kûrahiya vê karesata mirovî piştre wê zelal be.
Di her karesatekê de di hemû cîhanê de çavnihêrî ji hikûmetê ew in ku hindî bileztir bi hawara lêqewmiyan de herin, û ne tenê hemû hêsankariyekê bo bi hawardeçûna wan bikin, belkû beşeke zaf ya îmkanatan û hêza mirovî û madî ya hikûmetê bona derbazkirina xelkê ji vê karesatê û alîkarîkirina wan û baştirkirina rewşa jiyana wan û malyatê danên.
Lê di hikûmeta Komara Îslamî ya Îranê de, ne tenê ew kar nehate kirin, û li gora hewce bi hawara xelkê bellalêdayî de neçûn, belkû gellek bi derenge ve bas ji vê kirin ku erdhejê gellek xisara madî û canî li pey xwe hebû, û niha jî digel de be, her rastiyan vedişêrin.
Serbarê vê yekê jî hêzên ewlehiyê û Spaha Pasdaran anîne bo zexta li ser xelkê, ku nebe di vê rewşa nebaş de, ku xelk tê de ne, berbin canê rejîmê, û her wekî ku me dît hêza serkutkar ya rejîma Îranê li vî xelkê belengaz dida, û bê hurmetî bi wan dikir, ku hatibûn pere û nanekê bo zarokên xwe bibin. Tevî vê yekê jî yarmetî û karê hawardeçûnê ji aliyê demûdezgehên rejîmê ve ew qas kêm bû, ku hem xelkê lêqewimî rastî zexta derûnî û perîşaniya zêdetir hatin, û hem jî hemû Îranê zanî ku rejîma Îranê naxwaze ku hawara xelkê erdhejlêdayî ê Serpêla Zehaw û Ezgelle û Selasê û ...hwd û bajarên din ên Kurdistanê de here. Rejîmê ne tenê rewşa awarte ji bo alîkariya xelkê ranegehand, belkû zext jî xistiye ser vî xelkî, ku di rastî de gellek bi zehmet, termê miriyan li jêr kavilan de dertînin, ku dibe termê kuştiyan bibin pizîşkê bi nav dadwerî (pizişkê qanûnî) ê rejîmê, da ku ew îzna biaxêspartina terman bidin wan, û heya ku ew îznê nedin nabe ku tu termek bê veşartin!.
Serbarê van hemû xemsariyan û bi hawardeneçûna xelkê û serkutkariyan, ragehandin ku ew tu alîkariyeke derveyî welat wernagrin, û di nava cihên karesatlêdayî de jî, dibe ku hemû kar li jêr birêveberiya Spaha Pasdaran de bi rê ve herin.
Di rewşeke bi vî rengî de xelkê Kurd li hemû bajarên Kurdistanê li biryareke neteweyî û dîrokî de, hewla berfirehkirina komkirina yarmetiyê bo erdhejlêdayiyan, û bi hawardeçûna wan dan, û çendîn kempeyn rê xistin.
Di hemû gund û bajarên Kurdistanê de, dest kirin bi komkirina alîkariyan bo hevwelatiyan û hevzimanên xwe, li gund û bajarên parêzgeha Kirmaşanê de ku rastî rûdawa malwêranker ya erdhejê hatin.

Wêne û vîdyoyên ku xelkê asayî ên Kurd bi dûr ji hebûna tu ragehandinkarekî Îranî û bîhanî girtibûn, nîşan dan û wekî belge jî dimînin ku gelê Kurd piştî karestaa erdhejê, di demên herî dijwar de, û li bin zexta rejîmê û demûdezgehên wê û bi taybetî Spaha Pasdaran çi destanrêsiyek afirandin, û çawa hemû zext û givaşên rejîmêtêk dan, û bi hawara hevneteweya bellalêdayî a xwe ve çûn.

Komara Îslamî û Spaha Pasdaran xwestin ku bi dorpêça xelkê Kurd di van ciyan de ku erdhejê lêdaye, riha neteweyî û vîna vî xelkê bişkînin, û wan bixin qedeman, lê neteweya Kurd dubare selimand ku gellek hişyartir û amadetir û bimoraltir ji vê ne, ku Spaha Pasdaran û rejîma Tehranê lê fikirîbûn.

Di vir de hewce ye ku em bas ji hewldana Kurdan di beşên din ên Kurdistanê de bikin, ku hem bi peyamên hevxemiyê û hem jî bi hewldan bo komkirina alîkariyan, yek netewebûna Kurd cardin watedar kirin, û di hemû beşên Kurdistanê de hewla bi hawardeçûna qurbaniyên erdhejê hate dan. Herwisa rola hinek ji ragehandinên giştî ên Kurdistanê bilind dinirxînin, ku dem bi dem û roj bi rojê digel qurbaniyan û hewla hemû alî bo komkirina alkariyan bûn, û dengê qurbaniyan û hewla neteweya Kurd bo hawardeçûna wan gehandin guhê dinyayê.

Di vê navberê de, ku neteweya Kurd bi hemû şêweyekê îradeya netewebûn û bi hawardeçûna hevzimanên xwe diselimandin, du tişt cihê baldanê bûn, yekem hewla rejîmê bona vê ku Spaha Pasdaran bike biryarder û birêveberê van karan, û heya wergirtina alîakriyên xelkê bo vê ku bi navê rejîmê ve bide van alîkariyan bide xelkê, her bi vê armancê li çendîn ciyan de dest bi ser van alîkariyan de girt, lê xelkê tu baweriyek bi dem û dezgehên rejîmê nebû, û aîkariyên xwe nedane wan, û ji riya kes û rêkxirawên xelkî ve, ew erk û wezîfeyên xwe bi rê ve birin.
Duyem hewla xelkê xeyrî Kurd li bajarên din ên Îranê, ku her çend di destpêkê de tişteke wisa nedihate xûyakirin, lê digel vê ku zanîn ku rejîm xemsar e, ew jî bi dûr ji demûdezgehên rejîmê ji aliyê xwe ve dest kirin bi gehandina alîkariyan bi xelkê lêqewimî, û cardin rejîm ji xelkê cuda kirin.
Di bereberê komkirina alîkariyan û gehandina alîkariyê bi xelkê lêqewimî bûyereke din ya dilêş rû da, ku xelkê ji vê bûyerê jî destanrêsî afirandin.
Hevwelatiyekî xelkê Bokanê bi navê Ebûbekir Me`irûfî di dema gehandina alîkariyan bo xelkê Selas û Serpêlê, di bûyera vergeriyana trombêlê de jiyana xwe ji dest da. Vegeriyana termê xwedêjêrazî vegeriyaneke asayî nebû.
Her li cihê bûyerê, bajar bi bajar û gund bi gundên kurdistanê, li ser rê pêşwazî ji termê vî hevwelatiyî kirin û di hemû ciyan de, bi hezaran kesî ber bi pêşwaziya ji karwanê hevrê digel termê Ebûbekir Me`irûfî ve çûn, û di hemû ciyekî de, bi diruşma neteweyî û bi pilakardên hilgirê diruşmên şoreşgerane, Ebûbekir bi şehîdê Kurdistanê pênase kirin, û termê şehîd bû alaya nîştimanekê ku xelkê wê, hemû pîlan û dorpêçeke dijminan bezandin, û cardin bi hemase ve, îradeyeke bilind a neteweyî ya xwe selimandin. Pêşwaziya ji vî termî ku vedigeriya wargehê xwe, pêşwaziyeke neteweyî û dehan hezar kesî bû, û bi axê spartina wî jî, li wargehê wî de, li Bokanê tevî hemû zext û pîlanên rejîmê, birêkirineke hezaran kesî bû, ku cardin nîşan dan û selimandin ku ew neteweya gihîştiye asta herî bilind ya hişyarî û cesûriya neteweyî.

Deftera Siyasî ya PDKÎ tevî eşkerekirina xem û narehetiya xwe ya dubare bo hemû qurbaniyan û birîndarên karesata erdhejê, û hevxemiya digel malbatên wan, hêviya hindî zûtir başbûnê bo birîndaran dixwaze, û sersaxiyê dibêje, malbat û kesûkarên Ebûbekir Me`irûfî, ku di pêxema baweriyên xwe ên bilind de jiyana xwe ji dest da, û bû remz û sembola neteweyekê. Herwisa destxweşiyê dibêje hemû wan kesan ku bi her şêweyeke madî û xeyrî madî alîkariya lêqewimiyên erdhejê kirin, û spasî û pêzanîna xwe digehîne hemû wan kes û rêkxiraw û aliyan, ku di Kurdistana Rojhilat û beşên din ên Kurdistanê û li derveyî welat de, di vê pêxemê de pêngav hilgirtin, û erka xwe ya mirovî bi cî gehandin.
Herwisa Deftera Siyasî ya PDKÎ spasiyeke taybetî li hemû tex û qat û girûpên nava civaka Kurdistanê û neteweya xwedîmoral û çavvekirî û li ser hest ya Kurd dike, ku karesat li pey karesat û bûyerên nexweş li pey hev, bi ser wan de hatin, lê ew bi ew qasê moral û vîn û îradeyê ve pêkve bûn, û bi yekrêzî û hevsozî û hevpêwendiya mirovî û neteweyî destanrêsî afirandin, û ne tenê cîhan sersamê îradeya xwe kirin, belkû waneyên pêkvebûnê gehandin guhê têkoşerên xwe jî. PDKÎ şanaziyê bi neteweyeke weha dike, û di hemberî îradeya neteweyî û hesta pak û bêgerd ya mafxwaziya wan de serê hurmetê ditewîne.

Kurdistan avedan û Kurd serbilind

PDKÎ
Deftera Siyasî

19.11.2017
28.08.1396

www.arsivakurd.org

Pêşmercê serkevtinê, yekrêzî û pêkvebûn e



Kawe Behramî



Di heyama yek meha borî de, du karesatan sînorê coxrafî ê nîştimana Kurdan kirin armanc. Êrîşa Spaha Îraqê û bi taybteî Heşda Şe`ibî bo ser navçeyên Kurdistanî ên derveyî îdareya Herêma Kurdistanê û dagîrkirina Kerkûkê û awarebûna sedan hezar kesî û malwêranî û heya eva ku li Dûzxormato çalakên medenî bas ji jînosaydê dikin. Ew dagîrkariya ku piştî piroseya referandomê pêk hat, heya niha jî pilana helandina nas-nameya Kurdî tê de heye.

Karesateke din bellaya xwezayî (herçend ku gellek kes li ser sedemên rûdana wê nakok in jî) erdheja li parêzgeha kirmaşan a Rojhilata Kurdistanê ye, ku tevî canjidestdan û birîndarbûna bi hezaran kesî, herifîna dehan gundî û beşek ji bajarên Serpêla Zehaw û Selas û Ciwanro û Şahabad û awarebûn û bê malûhaliya xelkê vê navçeyê lê ket.

Di vê karesatê de rejîma Îranê, ku deshilata polîsî û zordariyê bi ser xelkê de ferz kiriye, zêdetir ji her demekê dijîgelîbûna wê ji xelkê Kurdistanê re eşkere bû, ku bi serwet û samana xelkê û xaka Kurdistanê, li ew qasê şermezariyê ve dixwaze di berjewendiya temenê biyom ê xwe de, mifahê jê wergire. Di demekê de ku gellekî hewce bû ku rejîm bilez hawara xelkê belengaz û erdhejlêdayî de here, û hewcehiyên wan ên dest-pêkî berhev bike.

Ya ku cihê dilxweşiyê bû, ew bû ku her di yekem demên bûyerê de, ne tenê li Rojhilata Kurdistanê, belkû di her cihekî Îranê de ku Kurdek li wir hebû, bilez û bi awayê xwebexş xwe gehandin wir, û alîkariyên xwe dane xelkê erdhejlêdayî. Gellek wêneyan em dibînin ku xelk kincên li ber xwe de jî didin wan. Komara Îslamî çavê wê ba nedigirt ku vê hevpêwendiyê di navbera xelkê Kurdistanê de bibîne, û di gellek ciyan de jî pêşiya wan alîkariyan digirtin, da ku li ser navê xwe van alîkariyan bidin xelkê.

Bi xweşî ve ragehandina azad û bi taybetî torên civakî rejîm riswa kirin, ji aliyekî ve, diziyên wan li wan eşkere kirin, û ji aliyekî din ve bêpi-rensîpî û dijîkurdbûna Komara Îslamî bo bîrûraya giştî zêdetir eşkere kir.

Xelkê Kurdistanê jî herçend rûyê rasteqîne yê rejîmê gellek ji mêj ve bû ku bo wan eşkere bibû, bi vê hevpêwendiya xwe nîşanî rejîmê û hemû aliyekî dan, ku Komara Îslamî tu pêgeheke wê di Kurdistanê de nine, hevkariya xelkê Kurdistanê bo hevnîştimanên wan li Kirmaşanê nîşan da, ku Kurd yek netewe ye, û Kirmaşan dilê Kurdistanê ye.

Êrîşa Heşda Şe``ibî û Spaha Îraqê li Başûr aliyê kêm deskevta %93 ji xelkê bo çendîn salan ji nav birin, lê di wê demê de jî, rûdawan nîşan dan, ku Komara Îslamî çi di piroseya referandomê û piştre û di vê rewşa nebaş ya parêzgeha Kirmaşanê de, çi kerb û kîneke dijî Kurdane ji her perçeyeke nîştiman heye, û yekîtiya xelkê Kurdistanê di dema pêşwaziya ji termê şehîdê riya mirovahiyê kak Ebûbekr nîşanî hemû aliyekî û bi taybetî hizbên Rojhilata Kurdistanê da, ku tevî parastina berjewendiya bilind ya neteweyî, amadeyê hemû guherînkariyekê ne, û tenê yekrêzî û yekîtiya di navbera hizban de dikare garantiya serkevtina yekcarî be.

Beşar Esed weke cinayetkarê şer hate naskirin

Beşar Esed ji bo carekî din ji aliyê saziyên mafên mirovan ve, weke cinayetkarê şer hate naskirin.

Saziya Lêborîna Navneteweyî, roja Duşemî 22`ê Xezelwera 1396`an, di raporekê de, Beşar Esed serkomarê rejîma Be`is a Sûriyê, heyan niha bûye sebebkarê kuştina 330 hezar kesên bê tawan yê xelkê Sûriyê, û weke cinayetkarê şer hatiye naskirin.

Di vê raporê de, dorpêça beşek ji xaka Sûriyê û derkirina bi zorê ya rûniştiyan ji aliyê artêşa Sûriyê û en-camên şer weke cinayetên şer hatiye pênasekirin.Herwisa bi eşkere bas ji vê yekê dike ku deverên ku dorpêç kirine, bombebaran kirine, û herwiha pêşî ji gihandina alîkariyên destpêkî ên mirovahiyê jî girtine.

Ev kiryarên artêşa Sûriyê ji aliyê rejîma Îranê ve tên piştevanîkirin, û her eva bûye sebeb da ku xelkê wan deveran destê wan negîje xwarin û derman û sotemeniyan, ku hewcehiyên destpêkî yên jiyanê ne, û ew yek dibe sebebê çêbûna karesata mirovî. Herwiha di vê raporê de, agirbesa di navbera hêzên dijber ên Beşar Esed û artêşa Beşar Esed de, weke karesatek ji bo jiyana xelkê hatiye pênasekirin, û ev agirbesa jî, wekî “rêçareya dîplomasiya berçav (zahirî)” bi nav kiriye, ku her bi vê sebebê jî mafên mirovan tê binpêkirin.

Di beşek din a vê raporê de hatiye ku, rejîma Beşar Esed bi hezaran kesî kuştine û aware kirine, da ku bi vî awayî bikare givaşan bixe ser dijberên xwe, û danûstandinan bi qazancên xwe tewaw bike.



www.agiri.org

Nerîna Lîderan



Mes`ûd Barzanî: “Kurdistan tenê ye, û bangewaza bo azadiyê bê bingeh e”.



El-cobeyr: “Erebistan di hemberî destdirjiyên rejîma Îranê de bêkar narûnê”.



Enwer Qereqaş:“Îran û Hizbullah sebebkarê serekî ê nearamiyê di navçeyê de ne”.



Hesen Nesrullah: “Me ne mûşekên balistîk, ne jî çekên pêşkevtî, û ne jî çekên din neşandine Yemenê.”.

Ji bo berbirûbûna digel Tehranê, Amerîka û Firansayê li hev kirin

Koşka Spî ragehand ku Trump û “Emmanuel Macron” li dijî têkderiyên rejîma Îranê, û riya berbirûbûnê rêkevtin kirin.

Piştî gotûbêja telefonî a di navbera “Emmanuel Macron” serkomarê Firansayê û “Donald Trump”, serkomarê Amerîkayê koşka Spî ragehand ku: Her du welatan li ser vê yekê rêkevtine kirine, da ku bi hev re, û bi alîkariya hevpêymanên xwe li dijî alozî û şerxwaziyên reîma Îranê û Hizbullaha Lubnanê bisekinin.

Li gora dawîn nûçeyan, biryar e ku di çend rojên din de “Emmanuel Macron” derheqê vê pirsê de digel rayadarên welatên cîhan biaxive, da ku wan jî bikêşa aliyê xwe, û di vê derheqê de navbirî digel “Michel Aoun” serkomarê Lubnanê, “Abdel Fattah el-Sisi” serkomarê Misre, “Mohammad bin Salman” cîgirê paşayê Si`ûdiya û “Antonio Guterres” serkreterê NY axiviye.



Macron di demên derbezbûyî de jî bas ji metirsî û gefên rejîma Îranê kiribû, û gotibû ku dibe derheqê bernameyên mûşekî yên Tehranê gotûbêjan digel wan encam bidin; pirsa ku dijkiriyara rejîma Îranê lê ketiye, û ji serkomarê Fransa yê rê gotine : Ev babeta tu pêwendiyek bi Parîsê ve nîne.

Her di vê derheqê de roja Yekşemî di rêkevta 28`ê Xezelwera 1396`an de, Yekîtiya Ereban di bajarê Qahîreya welatê Misrê de civîneke bilez pêk anîbûn, û gotibûn ku tevî nîşandan nerazîbûna xwe li hember siyasetên destêverdanên Tehranê, di karûbarên welatên deverê de, daxwaz ji Civata Ewlekariya Neteweyên Yekgiritî kirine, da ku gavên bilez û piraktîk li dijî Tehranê bavêjin.

Rejîm arteşê paksazî dike

Rejîma Îranê ku niha zêdetir ji her demekê xwe di metirsiyê de dibîne, kesên nêzî hizra Spahiyan dike fermandeyên arteşê.



Rayedarên rejîmê bo veşartina vê paksaziyê, di dema guherîna fermandeyan de bas ji “hemdilî” û “yekdengiyê” di navbera arteşê û Spahê de dikin.

Fermndeyê nû ê arteşê Ebdulrehîm Mûsewî ku axavtina xwe ya destpêkê bi baskirina ji yekîtiya di navbera arteş û spahê de bas kiriye, diselimîne ku hewla Xamineyî paksaziya arteşê ye ji wan kesên ku naxwazin nêzî spahê bibin. Di kiryareke bêsabiqe de, bo yekem car di nava arteşa Komara Îslamiya Îranê de, çar fermandeyên “hêza deryayî” bûne endamê Sitada arteşê, ku pêştir efserên hêza “bejahiyê” ya asrteşê rola serekî tê de hebûn. Herwisa deryavan Hebîbulla Seyarî piştî deh salan ku fermandê hêza deryayî bû, bo Sitada arteşê hate veguhastin, û bû cihgirê hemahengkirina arteşê. Çavdêr û şarezayên karûbarên leşkerî radigehînin ku dana berpirsayetiyê bi fermandeyên hêza deryayî, û vêdedana fermandeyên hêza bejahiyê û girîngînedana bi fermandeyên hêza esmanî cihê baldan û lêfikirînê ye. Bi taybetî eva ku Ebdulrehîm Mûsewî fermandê arteşê di axavtina xwe de bas ji yekîtiya di navbera Spah û arteşê de kiriye, û ragehandiye her kesek ji zimanê arteşiyan ve tiştenê binûse, ku bibe sedema pêkhatina nakokiyan, çi bizanebûn be, yan berevajî, ew yek dikeve xizmeta dijmin de.

Îsraîl hebûna hêzên Îranê di Sûriyê de qebûl nake

Îsraîlê li dijkiryara li hemberî berdewamiya hebûna hêzên rejîma Îranê di nava xaka Sûriyê de, ragehand ku dibe hêzên rejîma Îranê Sûriyê bi cih bihêlin.

Wezrê Karê Derve ê Rûsiyê Lavrof ragehandibû ku hebûna hêzên Îranî di nava Sûriyê de rewa ye, jiber ku ew li ser îzna Beşar Esed hatine wir.

Di heman demê de Lavrof ragehandibû ku rola hevalbendiya navneteweyî bi rêberatiya Amerîkayê di Sûriyê de ne baş, û ne yasayî ye, jiber ku armanca Amerîkayê piştgiriya ji girûpên dijberî dewleta yasyaî ye.

Nûçegihaniya Îsraîlê “Way Net” axavtinên Lavrof wekî lêdana sîleyekê li ser guhê dewleta Îsraîlê bi nav kir. Hinek ragehandinên din ên Îsraîlê jî ji zimanê kesekî ve ku berpirsekî payebilind ê Îsraîlê bûye, nivîsandine ku Îsraîl nahêle ku xetên sor bêne bezanidn, û hebûna hêzên Îranî di Sûriyê de tab nake.

Li gora nivîsa rojnameya “Yîsrail Hiyom” çapa Tilavîwê, serbarê raporên derheq lihevkirina Amerîka û Rûsiyê, ku piştî şerê di Sûriyê de, hêzên derekî di Sûriyê de namînin, Lavrof ragehand ku hewcehiya derketina hêzên Spaha Pasdaran, û hêzên din ên ser bi Îranê di Sûriyê de di gotûbêja bi Amerîkayê re bas lê nehate kirin.

Berpirsekî Îsraîlî jî ku nexwast navê wî bî eşkerekirin ragehandiye ku: Me bi Potîn ragehandiye ku hekî bezanidna xetên sor ên Îsraîlê bibin sedema berbirûbûna leşkerî bi Hizbullahê re jî, û aloziyan di Sûriyê de çêke jî, ewê vê yekê bikin.

www.arşiva.com

Pêşmergekî şoreşa 46-47`an çû ser dilovaniya xwe

Feqî Îbrahîmpûya xelkê bajarê Pîranşerê, li temenê 73 saliyê de çû ser dilovaniya xwe.

Li gora rapora gihîştî malpera Kurdistanmedia: roja Înê 26`ê Xezelwera 1396`an, "Feqî Îbrahîmpûya", xelkê bajarê Pîranşerê ku di salên 46-47`an de pêşmergê PDKÎ bû, di temenê 73 saliyê de çû ser dilovaniya xwe.

Navbirî piştî serkevtina şoreşa gelên Îranê, digel PDKÎ vegeriya bo Îranê, û di hêza "Mela Aware" de hate rêxstin, û piştre weke kadrekî destpak û cihê baweriyê di gumrika sînorê Pîranşerê de hate rêsixtin. Piştî vê ku Hizb çû aliyê Başûrê Kurdistanê, Feqî Îbrahîm di komîteya bajarê Pîranşerê û navenda Sipîseng de her erkeke hizbê ku pê hatiba spartin, bicî danî, û heyanî sala 1996`an bi sedema rewşa tendirustiyê û nebaşbûna rewşa jiyanê, li ser îzna hizbê vedigere bo hundirê welat û her bi vê sebebê jî neçar dibe dev ji pêşmergatiyê berde.

Feqî Îbrahîm heyanî dawiya jiyana xwe li ser bîr û bawera xwe sor û pêdagir bû, û ji aliyê xelkê deverê ve rêz û hurmeteke taybetî hebû. Termê navbirî di nav girseya xelkê nîştimanperwerê bajarê Pîranşarê de bi axê hate spartin.Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, sersaxiyê dibêje malbat û xizm û kesûkarên navbirî û xwe şirîkê xema wan dizane.

Dijberekî bibandor ên Komara Îslamî hate terorkirin

Rêberê "Tevgera Azadîxwaz ya El-ehwaz"ê li pêşberî deriyê mala xwe li Holendê, bi sê gulleyan hate terorkirin.

"Ehmed Mola Ebûnahiz" naskirî bi "Ehmed Nîsî" roja çarşemiyê hate terorkirin, û kesên nêzîkî wî, rejîma Îranê wekî biryarder û encamderên wê terorê bi nav dikin. Jiber ku li gor gotina kesên nêzîkî wî, rejîma Îranê berê jî hewl dabû ku polîsê navneteweyî, navbirî dersînorî Îranê bikin, û li wir dadgehî bikin.

Komara ÎSlamiya Îranê "Tevgera Azadîxwaz ya El-ehwaz"ê wekî girûpeke terorîstî nas dike. Wê girûpê ji nîveka sala 1997`an ve çalakiyên xwe dest pê kirin, û armanca xwe ya stratejîk jî rizgarkirina Xûzistan, Bûşêhr û Hormozgan û giravên kendawê (xelîcê) ragehandiye. Vê girûpê bawerî bi çalakiyên çekdarî li dijî Îranê jî heye.

Rejîma Îranê ji destpêka deshilatdariya xwe ve heyanî niha bona mana li ser kursiyê deshilatê hawara xwe biriye ber jinavbirina dijberên xwe. Di sala 1989`an de Dr. Qasimlo û hevalên wî li bajarê Viyenê hatin terorkirin.

Di sala 1990`î de Kazim Recewî ku yekem nûnerê Îranê di NY de, piştî şoreşa gelên Îran bû, li bajarê Jinêvê li nêzî mala xwe bû armanca şeş gulleyan û hate terorkirin.Di sala 1991`an de Şapûr Bextiyar li Parîsê de bo cara duyem hate terorkirin, ku navbirî jiyana xwe ji dest da. Navbirî kêmtir ji 40 rojan serokwezîr bû, ku şoreşa gelên Îranê rû da. Di sala 1992`an de Dr. Şerefkendî û hevalên wîli bajarê Berlîn a Alaman de hatin terorkirin. Cuda ji van kesayetiyên navdar bi dehan kesên din li derveyî welat û heta kesên wekî Daryoş Firûher û Perwane Firûher di navxwe de jî hatin terorkirin, ku ên di navxwe de hatin terorkirin wekî kuştinên zincîreyî hatin binavkirin.



Herçend piştî biryara dawiyê ya dadgeha Mîkonosê derheq dosiyeya terorkirina Dr. Şerefkendî û hevalên wî û destbiserkirina tawanbaran û tawanbarkirina rêberên herî payebilind yên rejîmî Îranê wekî biryarder û birêveberê terora Mîkonosê, û têkçûna pêwendiyên di navbera gellek ji welatên Ewropayî digel rejîma Îranê, em şahidê teroreke wisa ya rêberên hizb û girûpên siyasî ên dijberî Komara Îslamî ya Îranê li derveyî sînorên Îranê nebûn, lê kesên nêzîkî Ehmed Nîsî û çavdêrên siyasî ser vê baweriyê ne ku ew teror karê rejîma Îranê ye, û gumana vê heye ku rejîm cardin dest bi terorkirina dijberên xwe bike.

www.agiri.org

»»»» Dom nûçeya manşetê

Her piştî vê erdhejê, berpirsyarên rejîma Îranê dest kirin bi dana diruşman,û beşek ji wan serdana herêmên erdhejlêdayî kirin, lê di rastî de ne ji bo xizmetkirina bi lêqewimiyan, belkû ji bo dem derbazkirin û wênegirtinên sêlfî, û dana diruşmên derevîn.
Cuda ji vê yekê, berpirsyarên rejîma Îranê bedela gehandina alîkariyan, derdûna pirr ji kerb û kîn û nefret a xwe eşkere kirin û pêşiya wan alîkariyan girtin ku Kurdistaniyan ji bo xûşk û birayên xwe yên erdhejlêdayî dişandin.

Ji vê yekê jî pêkenoktir ew bû ku bankên hikûmeta Îranê di vê dema herî nexweş de, bi şandina SMS`an xelkê erdhejlêdayî agehdar dikirin ku dibe deynên xwe yê "Xaniyên Mêher" bidin,ku di rastî de ew xaniyên sist û ne standard, yek ji sedemên zêdebûna rêjeya qurbaniyan bû.

Her bi sedema van xemsariyên rejîma Îranê bû, ku çendîn hevwelatî serbarê vê ku ji karesata erdhejê rizgar bibûn,lê bi sedema nebûna stargehekê û kelûpelên germkirinê û dewa û dermanan, li navçeyên Ezgelle û Deşta Zehaw û Selasa Bawecanî rastî bellaya Komara Îslamî hatin, û tenê û tenê bi tawana Kurdbûnê jiyana xwe ji dest dan.

Lê ew hewlên rejîmê ser negirtin û gel biryara xwe ya dawiyê da,û her li yekem demên paş erdhejê li piraniya bajarên Kurdistanê ve Kurdistaniyan zendê xwe hildan,û li benda rejîma dijîKurd nesekinîn, û dest kirin bi komkirina alîkariyên dehan tonî ji xwarin û cilûberg û derman û hewcehiyên rojane.

Erdheja dilêş ya li gund û bajarên Kirmaşanê bû sedema vê ku gelê Kurd cardin biselimîne ku ew pişt û penayê yektir in.

Lûtkeya vê helwetsa neteweyî û mirovî û nîştimanî wê demê bû ku hemwelatiyekî xelkê Bokanê bi navê Ebûbekr Me`irûfî di dema gehandina alîkariyan de, di encama vergeriyana trombêla xwe de, jiyana xwe ji dest da.

Her ji cihê bûyerê ve gund bi gund û bajar bi bajarên Kurdistanê li ser rê bi hilgirtina pilakardên hilgirê diruşmên neteweyî û şoreşgerî pêşwazî ji termê vî hevwelatiyê Kurd kirin, û ew wekî şehîdê xwebexş bi nav kirin, û bi vî awayî hemaseyeke din afirandin û îradeya bilind ya neteweyî a xwe selimandin.

Di rastî de vê pêşwaziya dehan hezar kesî serbarê hemû zextên rejîma Îranê,hem nîşan da ku hişyariya neteweyî gihîştiye asta herî jor, û herwisa ew yek peyamek jî bû bi rejîma dijîgelî, ku ew nikarin bi pîlanên xwe yên dijîKurd, Kurdên erdhejlêdayî bi tenê bihêlin, û wan stûxwarê alîkariyên xwe ên herî kêm bikin.

Her di vê derheqê de Deftera Siyasî ya PDKÎ jî daxuyaniyek weşand ku di beşeke vê daxuyaniyê de hatiye: "Deftera Siyasî ya PDKÎ spasiyeke taybetî li hemû tex û qat û girûpên nava civaka Kurdistanê û neteweya xwedîmoral û çav vekirî û li ser hest ya Kurd dike, ku karesat li pey karesat û bûyerên nexweş li pey hev, bi ser wan de hatin, lê ew bi ew qasê moral û vîn û îradeyê ve pêkve bûn, û bi yekrêzî û hevsozî û hevpêwendiya mirovî û neteweyî destanrêsî afirandin, û ne tenê cîhan sersamî îradeya xwe kirin, belkû waneyên pêkvebûnê gehandin guhê têkoşerên xwe jî.

PDKÎ şanaziyê bi neteweyeke weha dike, û di hemberî îradeya neteweyî û hesta pak û bêgerd ya mafxwaziya wan de serê hurmetê ditewîne". Hêjayî basê ye ku deqa vê daxûyaniyê di rûpela 5 de hatiye weşandin.

Mamosta bi zorî pere ji dersxwanan werdigrin


بسمه تعالی
دعوت نامه
جناب آقای ولی دانش آموز کلاس
با سلام وتقدیم احترام،بدینوسیله از جنابعالی دعوت بعمل می آید که جهت اهدا کمک و مساعدت مالی شخصا به این آموزشگاه مراجعه فرمایید.
پیشاپیش از حسن نیت و همکاریتان نهایت تقدیر وتشکر را داریم.
ضمناً با توجه به مباحث مطرح شده در اولین جلسه انجمن اولیا ومربیان وتصمیم اعضاء انجمن حداقل کمک ۵۰ هزار تومان می باشد.
❖ زمان : درجریان هفته
❖ مکان : دفتر آموزشگاه فرهنگ
رئیس انجمن مدرسه فرهنگ

Di doma şîpela wergiritna pere ji dersxwanan, vê carê goviya bajarê Rebetê jî hat.

Li gora nûçeya gihîştî malpera "Kurdistanmedia"yê, di çend rojên derbazbûyî de, berpirsên xwandingeha "Ferheng" a bajarê Rebetê, bi şandina nameyeka gazîkirinê ji bo malbabatên dersxwanên vê xwandingehê,ji wan daxwaz kirine, tevî serdana malbatên wan ji xwandingeha zarokên xwe, ji zarokên wan re gotine ku dibe aliyê kêm 50 hezar Tûmenî alîkariya pere ji xwandingehê re bikin.

Ev hewla rejîmê û berpirsên xwandingehan, di çend salên derbazbûyî de, di çend bajarên din ên Kurdistana Rojhilat de jî rû daye, û bi awayekî berdewam bûye sebeba zêdebûna givaşên abûrî li ser malbatên dersxwanan û herwiha nerazîbûna malbatên wan peyî xwe re aniye.

Li gora zanyarayan di salên derbazbûyî de beşek ji dersxwanan ji ber destengbûnê û piştî berdewambûna berpirsên xwandingehan ji bo wergirtina pere, neçar bûne xwandinê bi cî bihêlin.

Ev daxwazane di halekî de ji malbatan tê kirin, ku li gora xala duyema a serekî û siyem a yasaya bingehîn a rejîma Îslamî a Îranê, erka dewletê ye da ku hewcehiyên perwerdehiyê di hemû astên xwandinê de dabîn bike, lê belê di encamê de dibînin ku ev yeka tenê dirûşmek e.

Herwiha di çend rojên derbazbûyî de her mînakeke bi vî rengî di çend gundên girêdayî ê bajarê Rewanser a ser bi parêzgeha Kirmaşanê de jî hatibû dîtin.

Beşa herî zêde a îdamkirî û binçavkiriyan di Îranê de kurd in



Sekreterê giştî ê NY raporek derheqê rewşa mafê mirovan di Îranê de belav kir.

Li gora rapora gihîştî Ajansa "Kurdpa"yê, " Antonio Guterres", sekreterê giştî yê NY di rapora xwe ya vê dawiyê de, derbarê rewşa mafê mirovan di Îranê de, îşare bi binpêkirina berfireh a mafên mirovan di Kurdistana Rojhilat de kiriye û ragehandiye ku: Beşa herî zêde a îdamkirî û binçavkiriyan di Îranê de ji kurdan pêk tê.

Di vê raporê de hatiye ku, piraniya kesên ku hatine îdam û binçavkirin ji kurdan pêk tê, û di 5 mehên destpêka îsal de, zêdeyî 90 kolberên Kurd hatine kuştin, û birîndarkirin. Her di vê pêwendiyê de, "Teymûr Elyasî" nûnerê Komela Mafê Mirovan a Kurdistan a Îranê di Jinêvê de ragehandiye ku, ev saziya mafê mirovan çavkaniya serekî a raporên saziyên NY di pêwendî digel binpêkirina mafê mirovan di Kurdistan a Rojhilat de ye.

Li gora amarên ku hatine tomarkirin ji aliyê navenda amara Ajansa "Kurdpa" yê ve, ji destpêka meha Kanûna Paşîn heyanî meha Çirriya Pêşîn a îsal, 2484 mînakên binpêkirina mafê mirovan di Kurdistan a Rojhilat de hebûne, ku li gora vê rêzbendê, 1828 hemwelatî hatine binçavkirin, û 177 kolberên Kurd jî hatin kuştin û birîndarkirin, û herwiha 64 hemwelatiyên Kurd ên din jî bi sedemên curbicur di girtîgehên Hikûmeta Îranê de hatine îdamkirin.

Sirr û seqemê jiyana jineka Kurd girt

Jineka Kurd ku bi sebeba erdheja çend şevên derbazbûyî di Kirmanşanê de, mala wan herifî bû, di yek ji gundên bajarê Selasa Bawecanî de ji ber sirr û seqemê jiyana xwe ji dest da.

Li gora rapora gihîştî malpera Kurdistanmedia jina kurd a bi navê, "Xawer Xosrewî" xelkê gundê "Nîwekare" a girêdayî Bawecanî ku ser bi malbateke naskirî di deverê de bû, bi sebeba nebûna stargehekê ji ber sirr û seqemê jiyan xwe ji dest da.

Bi sebeba bûyera sirûştî a erdheja di çend rojên derbazbûyî de, gundê Nîvekare, ji sedî 80 ji avahiyên wê hiloşyane.

Li gora nûçeya gihîştî malpera Kurdistanmedia, li ber erdhejê 8 hemwelatiyên wî gundî jiyan xwe ji dest dane, û 35 hemwelatiyên din jî birîndar bûne.



Li gora hindek zanyariyên din, her bi wan sebeban di çend şevên derbazbûyî de, çend zarokêm kêmtemen jî di bajarên parêzgeha Kirmaşanê de jiyan xwe ji dest dane.

Xelkê lêqewimî yên parêzgeha Kirmaşanê daxwaz kirine da ku canê hemwelatiyên wî bajarî biparêzin, lê belê rejîma Îranê heyanî niha bi awayekî micid amade nebûye xizmetgizariya mirovahiyê, ku erka hikûmetê ye, radestî lêqewmiyên wê bûyerê bike.

Rejîma Îranê pêş ji nûçegihanên biyanî digire

Piştî rûdana edhejê li Kurdistana Rojhilat de, berpirsên rejîma Îranê pêş ji nûçegihanên biyanî digirin, daku bûyerên edhejê ji bo derve belav nekin.

Li gora raporên belavbûyî, tevî evê ku cîhan û berpirsên pirraniya welatan hevxemiya xwe ji ber qurbaniyên edheja ku di bajarên Kurdistanê de çê bûye anîne ziman,û berpirsên rejîma Îranê weke hemû carê ketine dijminatiyê, û pêş ji nûçegihanên biyanî digirin û heta nûçeyên rast ên vê bûyerê jî belav nakin.

Her di vê pêwendiyê de, "Tomas Îrd Birînk" nûçegihanê New York Times a Amerîkî, di peyameke "Twitter"ê de belav kiriye, ku digel bûyera edheja ku di rojava ya Îranê de çê bûye, îzin nedan ku ev nûçegihanên din yê ku di Tehranê de dimînin serdana cihê bûyera edhejê bikin.

Edhej di demjimêr 8:18 deqeyan a şeva 21`ê Xezelwera 1396`an de qewimiye, û heyanî niha li gora amarên hundir zêdeyî 500 hemwelatiyên bajarê Kirmaşanê jiyana xwe ji dest dane, û nêzî 6 hezar hemwelatiyên din jî birîndar bûne.



Ev edheja di parêzgehên Loristan, Îlam, Kirmaşan, Sine û Urmiya Rojhilata Kurdistan de qewimiye, û li pirraniya bajaran de, bi taybet bajarê Kirmaşanê xesarên malî û canî lê ketine.

www.arsivakurd.org

Helbestvan Şêx Mîzbah helbesta Kurdî nas kir û pê re xwe nas kir

Helbestvan Şêx Mîzbahê Farqînê, alîm û helbestvanên kurdên weke Şêx Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Siyahpoş, Melayê Bateyî, Şêx Ebdurrehmanê Aktepeyî, Feqiyê Teyran, Tîrêj û Cegerxwîn bandor li wî kir û ew jî bû yek ji dîlgirtiyê helbesta Kurdî.

Gotenek pêşiyên Kurdan dibêje ku temen wek duvê masî ye, dişemite ji destê mirov û diçe... Wekî heval û hogirên xwe temenê Şêx Mîzbahê Farqînê jî bi ser heştêyan ket; lê weka duh di bîra wî de ye ku ew 14 salî bû û ji qalikê zabeşan keştiyan çêdikir û datînî ser ava kaniya mezin.
Şêx Mîzbahê Farqînê niha 80 saliî ye lê gelek haval û hogirên wî di bin erda sar de ne ku Şêx niha li ser erdê digire.



Gelek helbestvanên ku niha ji gelê Kurd re bûne wek kêlên zêrîn, çawa eşqa helbesta Kurdî niqutandin dilên xwe di medreseyên Kurdî de, Şêx Mîzbah jî di salên feqatiyê de bi helbesta Kurdî re hevnas bû.

Şêx Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Siyahpoş, Melayê Bateyî, Şêx Ebdurrehmanê Aktepeyî, Feqiyê Teyran, Tîrêj û Mele Şêxmûs ango Cegerxwîn bi helbestên xwe dilê Şêx Mîzbah guvaştin û ew jî bû yek ji dîlgirtiyê helbesta Kurdî.Şêx Mîzbah helbesta Kurdî nas kir û pê re xwe nas kir, ew êdî Kurd bû, kurdekî xurt, helbesta Kurdî her wisa doza Kurdî bû jê re, êş azar û xem; carna jî şoreş, serhildan û hemaset li ser tona helbestên wî xwe kifş dikir.

Di nav kuçe û kolanên teng de, her roj rêwî ye Şêx, di her bihostek de ew serboriyek xwe bi bîr tîne, Farqîn û Amed, her du bajarên qedîm ku di bin kevirên wan de sir û efsûna hezar salan veşartî.

Şêx Mîzbah helbestan dixwîne ji keç û xortên Kurdan re, şîret û tembiya li wan dike, dibêje ku bizanin, bixwînin, fehîm bin, bixwazin, bêjin, winda nebin, ji ber ku gelek nexêrxazên we hatin û çûn; lê em hîn li vir in. Rudaw

Romana Cihûyên Kurdistanê hate nivîsandin



Şûrê Mûsa navê romana nû ya nivîskar Sabîr Reşîd e û biryare di demekê nêzîk de bigihe bazaran.

Romanivîs Sabîr Reşîd ji Rûdawê re ragihand, roman ji çar beşên sereke pêk tê û di nava her beşekî de de beşên cuda hene.

Sabîr Reşîd amaje bi wê yekê kir, ku temaya sereke ya romanê li ser jiyana Cihûyên Kurdistan û Iraqê ye û bûyerên di romanê de hatine behskirin jî di navbera salên 1947 û 1951ê de li bajarên Hewlêr, Silêmanî, Kerkûk û navçeyên Koyê û Şeqlawa derbas dibin. Lê dema romanê bi flaşbak û vegotin heta roja me ya îro dirêj dibin.
Romana Şûrê Mûsa 192 rûpel e û biryare di demekê nêzîk de ji aliyê Rêveberiya Ragihandin, Çap û Belavkirinê ya Hewlêrê ve tê çapkirin û belavkirin.

Nivîskar Sabîr Reşîd, di sala 1957ê li navçeya Şeqlawe ya Hewlêrê ji dayik bûye. Di sala 1981ê de Koleja Yasa û Ramyarî ya Zanîngeha Bexdayê xilas kiriye. Di sala 1981ê de dest bi nivîsînê kiriye. Sabir Reşîd sernivîserê kovara “Mem” û endamê desteya nivîskarên kovara “Dengare” bû ku li Şeqlawe derdiketin. Herwiha rêveberê nivîskarên kovara “Herêma Kurdistan” û endamê desteya nivîskarên “Nivîskarên Nû” ye.

Romanivîs Reşîd heta niha 15 pirtûkên lêkolîn û rexnekirinê nivîsîne û çend pirtûkên wê yên roman, çîrok û lêkolîna wêjeyî jî ji bo çapê amade ne. Rûdaw

Konsêrta Kamkaran û Şehram Nazirî ji bo alîkariya lêqewimiyên erdhejê

Li Telara Wehdet a Tehranê konsêrtek bo qurbaniyên erdheja Rojhilatê Kurdistanê birêve çû, ku ji aliyê hunermendê Kurd Şehram Nazirî û koma mûzîkê ya Kurdî ya Kamkararan ve hatibû sazkirin.

Konsêrt 2 saetan berdewam bû û gelek xelk têde beşdar bûn. Şeva Yekşemî 12ê Mijdarê erdhejeke bihêz a bi pileya 7.3 Rîxterê Başûr û Rojhilatê Kurdistanê hejand.
Li Rojhilatê Kurdistanê, ji aliyê hikûmeta Îranê ve amarên ciyawaz li ser hejmara qurbaniyên erdhejê hatine belavkirin, bi awayekê ku di 3 rojên destpêkê de aliyên pêwendîdar ên Îranê hejmara kuştiyan bi 530 kesan dabûn xuyakirin, lê belê niha li gorî amara dawî yak u hikûmeta Îranê ragihandiye, di encama erdheja Kirmaşanê de 437 kesan canê xwe ji dest dane û zêdetirî 12 hezar kes jî birîndar bûne.

Herwiha li Başûrê Kurdistanê jî di encama erdhejê de 8 kesan canê xwe ji dest dan û 321 kes jî birîndar bûn. Rûdaw



www.ersiv.kurd.org

Zimanê Kurdî

Qursên Kurdî, A. Karabax

2-

b. Ji yên bergehê : Bi vir de, bi wir de, ber ve, serejêr, serejor, ber bi, ber bi ve, ji vî alî ve, ji wî alî ve, ji vê hêlê ve, ji wê hêlê de, hwd.
Mînak 517/1 : Hokerên cihê : Çend bikaranîn :
a. Xama xezal li wir diçêriya. b. Nêçîrvan li jêr bû, lê dinêriya.
c. Xezal beziya paş zinarê, li çepê rawestiya. ç. Nêçîrvan çû dereke din.
Mînak 517/2 : Hokerên bergehê : Çend bikaranîn :
a. Xama xezal serejêr rewiya. b. Nêçîrvên, ji wî alî ve da dû wê.
c. Paşê xezal bûn didu, serejor kirin. ç. Nêçîrvan bi wir de vegeriya.
4. Hokerên pirsiyarî(pirsiyariyê) :
a. Ev hoker ji aliyê pirsiyariyê ve çalakiyan didin nasîn.
b. Peyvên van, ji peyvên pirsînê yên ku bi erkên hokerî bikar tên pêk tên.
Ji hokerên pirsiyarî : Çawa, çilo, bi çi, kengî, çi demê, çi wext, ka, li ku,li kuderê, ji ku, ji kuderê, bi ku ve, ji ku ve, çiqas, qasî çi, wek çi, hwd.
Mînak 518 : Hokerên pirsiyarî : Çend bikaranîn :
a. Çavên Gulçînê çawa ne? b. Nalîn çi demê dixebite?
c. Xama xezal li ku diçeriya? ç. Nêçîrvan bi ku de vegeriya?
5. Hokerên mêjerê(çendaniyê) :
a. Ev hoker ji aliyê mêjerê ve çalakiyan didin nasîn.
b. Bo kifşkirina van, pirsên bi (çiqas, qasî çi, wek çi, hwd) li lêkerên pêveberî tên kirin.
Ji hokerên mêjerê : Kêm, kêmtir, zêde, zêdetir, bêtir, kêm û zêde, pir, herî,hin, hinek, bes, sirf, bi qasî, bi çendî, ewqas, gelek, deme-ke dirêj, keliyekê,yek bi yek, deh bi deh, zehf, zor, hwd.
Mînak 519 : Hokerên mêjerê : Çend bikaranîn :
a. Nalîn kêm dixebite. b. Rojda ne tiral e, kêm û zêde dixebite.
c. Kalê wê jî ewqas dixebite. ç. Wî kalî, dar pênc bi pênc jimartin.
Ji helbestan : .../ Rehên zerhimîn yek bi yek bi xwe de hatin/.../A. Karabax
B) Di hinek erkan de bikaranîna hokeran :
Mînak 520 : Ji bo wan çend bikaranîn :
1. Di awayê rewşîn de :
a. Gulçîn, bi xebatê bi ser ketibû. b. Ew ji dil de dixebitiya.

Tiştonek



A: Mahir Berwarî

Metelokên rewanbêjiyê

Ev beşe girêday rewanbêjiya peyv û hevoka ne, peyvên
wek hev lê bi mana ji hev cuda bi rengekê can/xweşik
didene ber hevdu şêlubêlê dixene têda ji bo mirov pê
nezane.

- Ka noka ne, ka noka ne, çiyê nezane hêwan e.
(* Ka noka ye)
- Pirr tan e, pirr tan e, çiyê nezanit hêwan e.
(*Pira ji tanî avakirî).
- Çîxar û gû se. (* Çîxar : Nav e)
- Ka çu ma dan. (* Ka û dan)
- Ka çû ma nok. (* ka û nok)
- Keru dirêjke. (* Kerû !! eve dirêjkê kalka çêkirnêye)
- Tiştekê mino tiştok e, yê bi kolav û dersok e, navê wî
zirçepok e, kure nebe bêj noke. (* Nok e)
- Tiştekê min heye, mîza. (* Mîh za)
- Tiştekê min heye, heqaska? (* Heqas ka?)
- Pêçû maşîn. (* pê çû, ma şûn)
- Mozterulîçe. (* moz, ter î lîçe)
- Giwêt heredune. (* giwêt her ew du ne.)
- Kilkî barîk xoy esture, kere tendûre. (* tendûr/ tenûr)

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

Xwendevanên hêja! Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi riya E-Maila Agiri2003@gmal.com ji me re bişînin



Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (314)

Çend wêne ji erdheja li Rojhilata Kurdistanê















